


welat

*Sokratesê
hemdem*



Rûpel 13

Sal:1 Hejmar:32 27 Îlon-3 Cotmeh 1992 5000TL (KDVD) Rojnameya Hefteyî

KURDINO RABÎN!



APÊ MUSA




"Bajarên Kurdistanê! Em hemû rabin ser lingan, wê me têxin kîjan hepsê? Talî wê îş bê vir. Ma gelo Tirk hîn jî yeqîn dikin ku, em 20 milyon Kurd êdî di welatê xwe de bênamûsiyê qebûl bikin."

Musa Anter (28 Adar 1992, Hejmar: 6)

REWS



Abdullah Keskin



Serxweşî ji bo neteweya Kurd

Dijminên me baş dibînin ku, ev gelê azadîxwaz û qehreman tenê bi êrîşan û bi hilweşandina gund û bajaran namire. Komkuştinên mezin bêhtir çavên gelê me vekirin û fedekariyê xurt kirin.

Nemaze di dema dawî de dijmin, bi hovîti êrîşan dibe ser rewşenbîrên me yê welatparêz. Ew ji kuştina rojnamevan û nivîskaran hêvî dikin ku, gelê Kurd bê deng û bê rêberiya ramanî bihêlin. Ew dixwazin bi kuştina Musa Anter û hevalên wî, tirsê têxin dilê rewşenbîrên welatparêz.

Em gelek bi xem in, dilê me dişewite li ser mamosteyên hêja û rênasên qedirbilind. Nûçeyên şehîdbûna wan hêstirên me diherikînin, lê xwîna me germtir û kerbên dilên me kurtir dikin. Gelê me îro hişyar e, armanca xwe diyar kiriye û rîya serxwebûn û azadiya xwe nas kiriye. Em bawer in, sed carî bawer in ku, gelê me doza şehîdên xwe bê xwedan nahêle û em di sa bawer in ku, êrîşên dijminan jî, bê bersiv namînin.

Her şehîdekî me serhildaneke bi rûmet û şerefeke mezin e.

Xebata gelê Kurd nayê sekînanandin, serhildan wê berdeham bibin. Jiyana bêmirin jî bo şehîdên serxwebûn û azadiyê.

Mirin jî bo dijminên hov.

Yekîtiya Rewşenbîrên Welatparêzên Kurdistan (YRWK) - Berlin

Tilîlî ji weqfa welatê me re Dara Daristan

Musa Anter di nivîsareke xwe de digot:

“Em Kurd heta niha bûbûn xulamê xulaman, Tirk, Erebi û Eceman...”

Tu rast dibêji Apê Musa. Heta hilpişkîna 84 an wisa bû.

Li cihêkî din digot:

“Însanê ku eşqa welatê wî pê re tune be, ji heywanan jî, li jêrtir e çima? Carna gundek ji gundekî din, kerekî yan jî çelekekê, gaki dikirre, te dit ew heywan ku filitî, direve dihere gundê xwe. Ez jî, ji temamê Kurdan re dibêjim ku, faşîst di welatê me de bi panzerên Amerîka pîrek û zarokên me biperçiqînin emê tevde herin devê serayan û bibêjin faşîstno, em hemû PKK'ci ne, bijî Kurdistan û hûn çî dikin ji me, bikin.”

Bajarên Kurdistanê, em hemû rabin ser lingan, wê me têxin kîjan hepsê? Tali wê îş bê vir. Ma gelo Tirk hê jî yeqîn dikin ku em 20 milyon Kurd êdî di welatê xwe de bênamûsiyê qebûl bikin?

Faşîstno, hûn qenc fêm bikin, heke xwîna şehîdên me û ariya şehîdên me yê pîroz (muqedes) li erdê bimîne, lanet li me Kurdan hemûyan bê.”

Em soz didin te. Em nema bênamûsiyê qebûl dikin.

Te li cihêkî din wilo digot:

“Ez vê tînim ser doza Kurdan, kesê ku tiştêk jê neyê tune ye. Ji piya, rûniştî, razayî û bi çavan. Hinek karin ji piya bikin, hinek karin wek min rûniştî binivîsandinê bikin, hinek karin bi peran bikin û yê ku ev hemû jî, ji wan neyên, karin dua bikin, lê xayintî, ew nabe. Dibe wek yekî bi çavan jî limêj neke lê, kufriya bike. Îca ew jî dibe kafir.

Êh, di temamê dînan de qetla kafiran jî helal e.”

Apê Musa em vî sozî jî didin te. Kî çî ji destê wî bê ewê bike.

Te digot:

“Em û hikûmet jî wiha ne, divê binivîse divê nenivîse, ê min ez weqfa welatê xwe me.”

Em weqfa welatê xwe, tewaf dikin. Tilîlî ji weqfa welatê me re.

Mesaj û serxweşî

Li ser kuştina Musa Anter, ji rojnameya Welat re, gelek mesajên protesto û serxweşiyê hatin.

Sekreterê Giştî yê Komeleya Mafên Mirovan Akın Birdal, Sekreterê Giştî yê Özgür-Der'ê Ayşe Kulak, Serokê PKG (HEP) Ahmet Türk, li ser navê Kovara Nûdemê Firat Cewherî, Kovara IBDA-C Taraf, li ser navê weşanxaneya Komal a İzmirê Abdullah Soydan, Metin Gürleyen, li ser navê Polîtîburo ya Partiya Komunîst a Swêdê, Tedy John Frank, Tûm-Bel-Sen a İzmirê ofîsên 1 û 2 a Armanc, Özgür Halk, bi mesajên ku şandin rojnameya me, bûyerê protesto kirin û serxweşî dane me.

Kovara Özgür Halk: Em ji rojnameya Özgür Gündem, Yeni Ülke, Welat û Enstîtuya Kurdî re, li ser kuştina Musa Anter, serxweşiyên xwe bi rê dikin û êrîşên şebekeyên cinayetê, bi kî n û nefretê protesto dikin.

Rojnameya Armancê: Me bi dilşewatî û bi xemgîniyê mezin, xebera şehîdbûna Kurdperwerê dilsoz, nivîskarê Kurdê mezin ê rojnameya we, Apê Musa bihîst. Şehîdbûna Apê Musa ne ji bo rojnameya we bi tenê, jî bo hemû gelê Kurd win-

dabûneke gelek mezin e. Em ji we û ji malbata wî re sebir û metanetê dixwazin.

Tûm-Bel-Sen: Nivîskarê we yê hêja, ronakbîr, welatparêz û daxwazvanê biratiya gelê Kurd û Tirk Apê Musa, ji hêla hêzên tarî (!) ve hate şehîdkirin. Pênûsa wî li erdê namîne.

Polîtîburo ya Partiya Komunîst a Swêdê: Kuştina welatparêz û şervanê azadiyê Musa Anter, ji bo me bû sebebê eş û xemgîniyê mezin. Ev êrîşên dewleta faşîst, berê xwe daye mirovên 80 salî jî. Dê dirok, derfeta tolstandina xwe bi dest bixe.

Metin Gürleyen: Qetilkirina nivîskarê bi rûmet Musa Anter, bi xemgîniyê mezin hîn bûm. Bila serê we sax be.

Abdullah Soydan weşanxaneya Komal a İzmirê: Ê ku ji bo xelasiya gelê Kurd bixebite, ji mirinê re jî, amade ye. Qatilên wî veşarî nîn in. Em jî, bi baweriyê xurt dibêjin: “An serkevîtin, an mirin.”

Kovara IBDA-C Taraf: Em, kuştina nivîskarê we Musa Anter bi dilêşiyê mezin hîn bûn. Bila serê we sax be û hîsa tolehildana we timî (daîm) be.

Kovara Nûdem: Ji wan we ye ku, wan ew çirîsk vemirand, ew

rûpel çirand. Lê ew dixapin Apê Musa. Bi te, bi Muhamed, bi Îsa; emê çirîska te geştir, rûpela ku te vekiriyê firehtir bikin.

Sekreterê giştî yê Komeleya Mafên Mirovan, Akın Birdal: Girîng e ku, berpirsiyarên van şebekeyên cinayetê derxînin holê. Em serxweşiyê didine we.

Sekreterê Giştî yê Özgür-Der'ê Ayşe Kulak: Hikûmeta DYP û SHP ê, bi sozê demokrasiyê hatin iqtîdarê. Piştî kuştina 8 rojnamevanan, bi kuştina Musa Anter jî, yekcar îflas kirin. Dê ev welatparêzên hêja di têkoşina me de bijîn.

Serokê PKG (HEP) Ahmet Türk: Avakê partiya me, Enstîtuya Kurdî, Weqfa Kurdî, Klûba Pen a Kurdî; nivîskarê Özgür Gündem, Yeni Ülke û Welat welatparêzê mezin Musa Anter hate kuştin. Qatil, kontr-gerîla ne. Kontr-gerîla şaxêke dewletê ye û di bin mesûliyeta hikûmetê de ye. Delîlên vê yekê jî hene. Ev qetlîam bi plan û program e. Amadekariya qetilkirina giştî dikin.

Peywira (wezîfe) partiya me, endamên me û rewşenbîrên me ew e ku, ev êrîş û kemînen xayîn, li ber çavên gelê dinyayê û di dirokê de mehkûm bikin.

Wekî din ji Melsa, YRWK-Berlîn û ji Partiya Sosyalîst a Swêdê jî mesaj hatin.



Rê di kontrola gerîla de ne

Têkoşîna neteweyî bi rengekî geş didome.

Gerîla jî di şer de, bi êrîş û livbaziyên xwe artêşa dagirker bi paş ve dixê. Rîyên Kurdistanê jî hêzên dewletê, jî cerdevan û xayînan re êdî asê bûne. Ev hefteya çûyî jî, gerîla livbaziyên xwe kêm nekirin û domandin. Nûçe yên bûyerên heftiya çûyî ev in.

18.9.1992: Li çiyayên Şirnexê, di nav cerdevan, hêzên dewletê û gerîlayan de, şer derket. 4 leşker û 3 cerdevan hatin kuştin. Gerîla riya navbera Sertê û Dihê (Eruh) girt. Nasnameyan qontrol kirin û 4 karkerên PTT'a Sertê bi xwe re birin. Dawiyê, 2 karker berdand.

Li Qoserê (Kiziltepe) midurê Banqaya Ziretê ya Cizîrê, jî alî hizb-î kontra ve hate kuştin. Li dijî vê kuştinê esnafên Cizîrê kepenk girtin. Li Batmanê hizb-î kontrayekî, welatparêz Aydın Görmü di dikana wî de birîndar kir.

Li ser vê bûyerê xelkê ev

hizb-î kontrayî lînc kir û kuşt.

Li Bedlîsê, gerîla jî gundê Însol 7 cerdevan revandin.

19.9.1992: Li navça Farqînê (Silvan) 2 endamên hizb-î kontra hatin kuştin. Li Paloyê, li gundê Ziwêrê, di nav leşker û gerîlayan de şer derket. Leşkerê hat kuştin û 2 jî birîndar bûn. Li nêzîkî navça Gêncê gerîla li stasyona Suvêren gule reşandin trênekê, 2 leşker birîndar kirin.

Li Midyadê li gundê Eynkafê cerdevanek pêl mayinê kir û mir.

20.9.1992: Li navça Stewrê (Savur) gerîla rê birî, serokê SHP'ê yê Stewrê û 3 kes kuştin. Li Pasûrê (Kulp) gerîla depoya titûnê bi tevî 600 ton titûn ve şewitandin.

Li çiyayê Sasonê, di nav hêzên dewletê, cerdevan û gerîla de, şer derket, 6 leşker û 4 cerdevan birîndar bûn.

21.9.1992: Li Muşê, gerîla êrîşî ser qereqola jandarma ya nehiya Kızılağaçê kir. Leşkerê kuştin û gelek leşker jî bi-

rîndar kirin. Li Çelê (Çukurca) gerîla êrîşî ser qereqola Sivritepe kir, 4 leşker birîndar kirin.

Li Nisêbinê, hizb-î kontrayek hate kuştin.

22.9.1992: Gerîla êrîşî ser navça Pasûrê (Kulp) kir. Dozger (savci) û dadgerê (hakim) Pasûrê kuştin.

Li wêranşarê (Viranşehir) hizb-î kontrayek hate kuştin.

23.9.1992: Li Bedlîsê, li nêzîkî gundê Çeltîk, li herêma Şêxciman, di nav leşker û gerîla de şer derket, 10 leşker hatin kuştin û 20 jî birîndar bûn. Li Diyarbekirê, gerîla avête ser gundê Baxivar, propaganda kirin, belavok belav kirin û 6 hizb-î kontra bi xwe re birin. Dû re jî, ji van hizb-î kantrayan 3 kuştî, 2 jî birîndar hatin ditin.

Li Bismil, li nêzîkî gundê Aslanköy gerîla tesîsa Shell'ê şewitand.

Li Dêrsimê (Tunceli) li nêzîkî Newala Laşê, gerîla rê birî, nasname qontrol kirin, propaganda kirin û şubeyeke "İller Bankası" yê şewitandin.

24.9.1992: Riya Siwêrêk û Diyarbekirê, ji alî gerîla ve hate girtin. Gerîla kontrola nasnameyan kir û nêzîkî 4 saetan rê girtî hişt.

Li Farqînê (Silvan) welatparêzek ji alî hizb-î kontra ve hate kuştin. Gel bi dû qatîl ket û ew di malekî de zewft kir. Ev mala ku qatîl ketiyê, malekêşverû ye û serokatiya van kontrayan dike. Qatîl jî vê malê gulle reşand ser gel. Dawî polis hat û qatîl jî nav destên gel derxist. Li Batmanê jî, welatparêzek ji alî kontrayan ve hate kuştin. Li Diyarbekir, cerdevanek li sûkê hate kuştin.

Serê gelê me sax be

Apê Musa! Tu nemirî. Tuvê herdem de dile me de bijî û ji gelê Kurd û me hunermendan re, bibî dara jiyane.

Belê, Apê Musa, ne tenê rojnamevan bû, an jî nivîskar bû. Ew bi kesaniya xwe ya pispor ve, kaniya hemû dewlemendiyan bû. Pêşvebir û parêzvanê nîrxên neteweya me bû.

Apê Musa! Sond û peyman li ser me be ku, em hunermendên Kurdistanê, emê pênûsa te ya bi rûmet li ser rastiya rizgarkirina Kurdistanê bi kar bînin.

HUNERKOM

"Yekitiya Hunermendên Welatparêzên Kurdistan"



HAWAR

Dilbixwîn



Mafê terore di destê dewletan de ye

Navenda Nûçeyan- Sekreterê Giştî yê PDK-Î (Partiya Demokratî Kurdistan a Îranê) û 3 nûnerên partiyê, ji alî ajanên SAWAME ya Îranê ve, li Almaniya, li bajarê Berlinê hatin kuştin. Sekreterê Giştî yê PDK-Î Dr. Sadiq Şerefkendî, tevî heyeta pê re, ji bo beşdariya civîna Enternasyonal a Sosyalîst li Berlinê bû.

Dr. Sadiq Şerefkendî, piştî

kuştina Dr. Ebdurehman Qasimlo di 1990 an de, ji bo serokatiya partiyê hate bijartin û ew jî di rêça Qosimlo de, ji bo otonomiya Rojhilata Kurdistanê têkoşin dida.

Weke ku tê zanîn, Qasimlo di sala 1990 an de, li Viyanayê bûyî ku haya kesî jê hebe, bi ajanên Îranê re, ji bo çareserkirina pirsê otonomiya Rojhilata Kurdistanê, rûniştibû.

Belê dewleta Îranê, ew bi ajanên SAWAME yê da kuştin. Piştî vê bûyerê 2 sal bi şûn de, Dr. Sadiq Şerefkendî tevî heyeta pê re li Almaniya hate kuştin. Beriya kuştina heyeta PDK-Î, Serokkomarê Îranê Mesut Recavî, ji bo kuştina muxalifan li derve, daxuyaniyekê weşandibû. Ev jî, tiliya Îranê di van bûyeran de eşkere dika.

Dewletên ku Kurdistanê

dagir kirine, ji bo rê libergirtina têkoşina neteweyî, her cure terore li ber çavên dinyayê dimeşnin. Gund û bajarên Kurdistanê hildiweşînin û talan dikin. Gel bi awayeke hovane qir dikin, serokên gel dikujin û ev hemû li ber çavên dinyayê û bi raya welatên kapitalîst-Împeryalîst çêdibin. Hêviya me ew e ku, ev bûyer tişteki hîne ew parti û rêxistinên ku ji bo otono-

miyê şer dikin û bidestxistina vê otonamiyê jî di raya welatên împeryalîst de dibînin, bike. Lewre divê bê zanîna ku, kuştina van serokan, ne tenê bi destê welatên dagirker, belê bi destek û raya welatên împeryalîst jî çêdibe.

Daxwaza otonomiya û têkoşinên di vê riyê de, bê encam in. Ev parti û rêxistin, bi van daxwazên paşverû xwe û gelên bi xwe ve girêdayî, dikin gepên biçûk û dagirker ew bi hêsanî dadiqurtînin. Ev bûyera han jî, îspata vî tiştî ye.



Sekreterê Giştî yê Partiya Demokratî Kurdistan a Îranê, Abdurrahman Qasimlo jî, di sala 1990 an de, ji aliyê ajanê SAWAME ve hatibû qetilkirin. Îran, li dijî Kurdan ji metodê terofist pê ve tu rê nas nake.

Serdozgeriya Almaniya li pey çi ye?

Almaniya, Welat- Dozgerê Federal, heta ku failên cinayeta li Berlinê bibîne, ji bo bindoşekkirina bûyerê, PKK'ê sêdar dika.

Li ser kuştina Sekreterê Giştî yê PDK-Îran Dr. Sadiq Şerefkendî û sê hevalên wî yê partiyê, dest bi spekulasyonên cur be cur hate kirin.

Yek ji van jî, daxuyaniya Serdozgerê Federal ê Almanyayê ye. Daxuyaniya piştî bûyerê 11 saet bi şûn

de hatiye kirin, ev yek jî gelek şik û gumanan bi xwe re dihîne (tîne). Di kuştina van kesan de, maqamên Ewlekarîtiya Alman, berpirsiyar e. Di bûyerê de, ji bo îhmalkarbûna xwe veşêrin, tiştên ne rast diavêjin rastê û dixwazin ev bûyer jî, mîna cinayeta Viyanayê neyê ronîkirin.

Raqîp nişandina PKKê û PDK-Îran a Serdozgerê Federal, ya nezaniya wî ya

siyasetê yan jî, dilxerabiya wî dide nişan. Ev yek ve gumanê (şike) bi xwe re tîne ku, rayedarên Almaniya Federal ji vê bûyerê agahdar in, lewre dozgerê birêz bi xwe jî dizane, di navbera PKK û PDK-Îranê de tu dubendîtî (dijberîtî) nîn bû.

Em vê daxuyaniya Serdozgerê Federal bi vî rengî dinirxînin ku, ji bo Dozgeriya Federal doza PKK ê ya Düseldorfê di eleniya

PKK ê de bide encimandin, bê sînciyek (ehlaqiyek) û skandalek mezin dika.

Me berê jî dabû xuyan ku, wê meqamên Tirk êrîşê Kurdan bike. Ev cinayet di dema seredana (ziyareta) Heyata Parêzî ya Tirk de hate kirin û meqamên Ewlekarîtiya Alman jî, cinayetê avêtin stuyê PKK ê. Ev yek jî me gelekî difikirîne. Li gorî agahiya ku me bi dest xistîye, komek endamên Kontr-gerîla hatine Almaniya û haya rayedarên Alman jî, jê heye. Herkes dizane ku ajanên MIT a Tirk, li Almaniya hespên xwe direwiqînin. Ev timên hanê, kes nikare bibêje ku ji bo seredanek turîstîkî, li Almanyayê ne.

Em di sa didine xuyan ku, wê Hîkûmeta Tirk hem li Almaniya û hem jî li cihên din êrîşî kesên Kurd û avahiyên Kurd bike. Em bala hikûmeta Alman dikîşînin ku berpirsiyarê êrîşên li Kurdan û avahiyên wan werine kirin, ew bi xwe ne. Em gazî û banî meqamên Alman dikin ku, bila dev ji vê yekê ber din. Bila di derbarên cinayetên polîtîk de, me Kurdan suçdar nekin. Em bi bîra wan dixin ku, ev helwesta wan li hember gelek şî milyon e. Em hem vê cinayetê û hem jî hewldana wana ku dixwazin ve cinayetê ji bo daxwaziyên xwe yê qirêj û gemarî pêk bînin protes-to dikin.

GOTÎN



Yaşar Kaya



Gelê Kurd Enqerê dîsa hejand

Navenda Nûçeyan- Partiya Keda Gel (HEP) kongreya xwe ya duyemîn a awarte çêkir û Ahmet Türk bû serokê giştî yê partiyê. Li ser vê komcivînê gelek tişt hatin gotin û nivisandin.

Rojnameyên burjuwazî bi hemû nivîskarên xwe yê navdar ve dest bi spekulasyonên xwe kirin. Di vê navê de, Serdozgeriya Ewlekariya Dewletê ya Enqerê jî dest bi lêgerîna kir da ku P.K.G (HEP) sûcdar bike.

Lê em di vê nivîsa xwe de dixwazin li ser kongreya Partiya Keda Gel a duyemîn bisekinin. Komcivîna awarte ya yekemîn û duyemîn, em dixwazin wan rabeî hev bikin.

Komcivîna dawiyê mîna ya yekemîn ne ewqas livdar û gel jî ewqas zêde coşdar nîn bû. Lê, gel zêde beşdarê ve komcivînê bûbû. Ên ku herdu komcivîna jî şopandibe (taqîb kiribe) di serê wî de hinek pirs peyde dibe. Mirov dikare van pirsan ji xwe û ji kesên din bipirse. Gelo çima komcivîn ewqas sar derbas bû? Çima delege bi temamî beşdar nebûn û eleqedarbûna wan hindik bû? Kongre çûna bi berendamek tenê hate kirin? Mirov pirsan dikare zêde bike lê, ev pirs bi tenê jî bêne bersivandin dê gelek tişt ro-



Ahmet Türk

nî bibe.

Carek Partiya Keda Gel li gorî kongreya xwe ya awarte ya yekemîn zêdetir xwerû bûye.

Di komcivîna awarte ya yekemîn de, di nav hêzên siyasî de pêşbaziyek, hemberiyek hebû. Ev yek tansiyona komcivînê gelekî zêde dikir.

Delege, li gorî berê hin bêtir gihîştibûn, kemilbûn û bi mentiqî dilivîyan. Ji hîs û pejnê gelekî dûr ketibûn. Di komcivîna yekemîn de hê nû bûn, xwîn di rehê canê wan de dikeliya. Li hember raqîbên xwe bi bizav bûn. Ew rewş bû ku kongreyê dilivand.

Delegeyan, ji dirûşm (slogan) an zêdetir girîngiyê didan fikr û ramanê. Vêca tam dixwestin siyasî bikin û bi hiş, piyên xwe diavêtin.



Delegeyan, saîona kongrê bi ala kesk û sor û zer xemilandin.

Berpirsiyarbûna xwe baş fêm kiribûn. Mirov vê yekê di peyvînen delegeyan de didit.

Bi berendamek tenê kirina kongreyê hinek tansiyonê daxist û delegeyan jî aciz û sar kir. Sarbûna delegeyan, ji vê rewşê dihat. Delegeyên ku hatibûn kongreyê nêrehetbûna xwe bi peyvên tund û tûj dianîn zimên.

Li gorî delegeyan ev derbeyeke ku, meclîsa partiyê bêyî delegeyan, di nava xwe de ray avêtine û Ahmet Türk hilbijartine.

Bi vê kirina xwe, meclîsa partiyê tu rûmetek nedaye

hemd û vîna delegeyên xwe.

Bi rastî jî, bi berendamek tenê kirina kongreyê ne tişteke xweş bû. Divê rûmeta delegeyan bihata girtin. Lewre divêtiya gelê me bi sihêtiya (cerbandina) demokrasîyê pîrr heye. Divê mirov van keys û fersendan qenc bi kar bîne.

Tam ne beşdarbûn, ne eleqedarbûna delegeyan em diştirin, ku bi vê rewşê ve girêdayî ye.

Di gel van hemû yekan, Kongreya Partiya Keda Gel a awarte ya duyemîn dîsa hinek rastiyan der xiste holê. Lewre her çiqas dewlet tevî

nivîskar û ramangerên xwe ve dixwaze P.K.G (HEP) ber bi xwe ve bikişîne û ji PKKê re bike raqîb jî, hem mebûsên partiyê û hem jî delegeyên partiyê bi eşkeretî tevî gelê ku beşdarê kongreyê bûbûn, dane xuyan ku, rêzan û rêberê gelê Kurd PKK bi xwe ye. Ji PKKê pêştir, tu hêz û partiyê qebûl nake.

Gel êdî tevî niwenerên xwe di hemû qadan de bi dengê êlî serokatiya PKKê tîne ziman. Serokê gelê Kurd PKK ye. Muhatabê pirsgirêka Kurdî jî ew bi xwe ye.

Özgür Gündem hat komkirin

Navenda Nûçeyan- Dadgeha Ewlekarî ya Dewletê ya bajarê Stenbolê (DGM), di derbarê rojnameya Özgür Gündemê, hejmarê 22 ê îlonê 1992 an de, biryarê komkirinê da. Dadgeha Ewlekarî ya Dewletê sebebê komkirina rojnameyê, îlana Abdullah Öcalan û du nivîsên ku di rojnameyê de, li ser qetilkirina Musa Anter hatibû nivîsîn dide xuyan. Xwedêgirawî di nivîs û îlanê de, di eleniya yekîtiya dewletê de propaganda hetîye kirin.

Îlana ku serokê PKKê Abdullah Öcalan di derbarê qetilkirina rewşên Kurdê navdar Musa Anter de dabû, ev e:

"Têkoşerê gele Kurdê porspî, mirovê zana û qenc ku temenê (emrê) xwe fedayî têkoşîna neteweyî kiribû, bû hedefa şerê gemaî û guleyên teresên vî şerî. MUSA ANTER nemir. Porê wî yê spî ku di çirûsî di xwîna sor de hesikî. Hesabekî me, bi wan kesên ku vê canwariyê kirine û vê bûyerê bi vî rengî, di rûpelên dirokê de, dane nivîsandin re heye.

Bila serê gelê Kurd û Tirk sax be."

Kürt halkının ak saçlı mücahidi, ömrünü halkının ulusal mücadelesine, adanmış, yi ve bilge insan

MUSA ANTER

yetmişdört yaşında kırlı savaşçı ve alçakların kurbanlarına hedef oldu. MUSA ANTER ölmüştü. Onun ışık saçan ak saçları kırmızı kana bulaşmış. Bu harharaca canverdiği insanlık tarihinin kırlı sayfalarına yazanlardan sorulacak hesabımız olacaktır.

Kürt ve Türk halkının başı sağ olsun
ABDULLAH ÖCALAN

Belavoka Rizgarî

Navenda Nûçeyan- Partiya Rizgariya Kurdistan, li ser bûyerên nêzik belavokek belav kir. Partiya Rizgarî, di vê belavoka xwe de, li ser kirinê dewleta Tirk bi taybetî jî, li ser provokasyona Şirnexê disekine. Behsa bernameya (programa) dewleta Tirk a ku di pêşerojê de, dixwaze li ser gelê Kurd pêk bîne, dike.

Di gel vê yekê, li ser têkiliyên Berzanî û Telabanî yê bi Enqerê re radiweste û vê danûstandina di navbera dewleta Tirk û Berzanî û Telabanî de protesto dike. Di belavoka xwe de jî bo PKK'ê jî wiha dibêjin: "Em dixwazim bidin zanîn ku li hember programên dewletên imperyalîst û mêtîngêkar li rex PKK'ê cih distînin û li dijî êrîşan jî em di milê PKK'ê de ne."

Hem jî aliyekê ve, daxuyaniyê wiha dikin û hem jî bi kom û komikên reformîstan re kar û xebatan dikin. Bi kes û komên ku ji Telabanî Berzanî ne dûr in re govendê digirin.

Piştî 74 salan, te ji nû ve dest bi jiyane kir mamosteyê heja



MUSA ANTER

Sond li me be ku emê nehêlin çeka (xama) te ziwa bimîne. Emê her wê di rûyê dijmin de, biteqînin. Emê qorziya te vala nehêlin.

YRWK
"Yekîtiya Rewşenbîrên Welatparêzên Kurdistan"

Ma semedê şewa Şirnexî, Stokholm ra şanî Uppsala. Şaristanê Uppsala, yew şaristano keyen û tarixî yo. Hetey pîley ra (girdey) zî şaristanê Swêdê yê pancin ya zî şeşin o. Yewna xusuiyetê Uppsala zî no yo; Uppsala şaristanê teleban o. Unîversîtey Uppsala zaf vengana dawo.

Ma wexto ki Stokholm ra şanî Uppsala, ez rayir ra Şirnexê pejmiriyeña (duşmişeña). Nê rojê peyenî resm û filmê Şirnexê ki mi tv. di dî, çimandê mi ver a şanî û yenî. Derheqê Şirnexê di, çî mi diyo û eşnawito ez wazena biyara xwi virî. Şirnexo ki ewro ziwandê şarî ra nêkuweno, Şirnexo ki Konseya Ewropa, Enternasyona la Sosyalist alaqeder keno, Şirnexo ki yew bi yew bi banê cê, gulane neyaran rî biyî hedef, Şirnexo ki biyo temaya deyîr û şîran, Şirnexo ki bi tenya Ewropa di biyo sebebê bê hesab miting, protesto û şewan, Şirnexo ki ronîştexanê yê, yo terk kerd, Şirnexo ki biyo hêvî û dardê ma hemîni.

Halbiko mi no Şirnex çend serrî ra ver dîbi. Ay wext kam çî zanaynî do çend serrî ra pey Şirnex ehendey meşur bibo. 1978 bi, welatperwero erjiyaye Munîr Anik rayirdê Darahênî (Genç) ser o, cendirmanê Dewleti hetî, bi destê axanê xayînan kişiyabi. Ma semedê eza şîbî Şirnex. Hetanî ma weyra resay meyît wedartibi. Ma şî key birardê Munîrê rehmetî. Ay wext Şirnex hezey gelek qeza şaristananê ma belengaz bi: Paştay yew koy di çend sey hebî banî, çend dikanê û çend hebî biney hikmatî. Helbet gurzê Dewleti û ey axandê mintaqe zî şarê Şirnexê ser o bi. Şarê Şirnexê zî bê wayir û milçewt bi.

La nika? Şirnex biyo kela xwiverûdayişê û cengê azadiyê. Şirnex biyo sembolê xwiserbiyayîşî. Şirnexijê Milçewtî, belengazî û pelşikteyî biyî heze şêrê koyan. Xwira cora Dewletey Tirkan heme hêz û qewetê xwi dawo şaristanê Şirnexê ser. Cora Dewleti Şirnex da topan û tankan ver û wêran kerd.

Salona Katedral skolan di (salona ki şewa Şirnexî virazaynî), cenî, camêrd, pîl û şinikî 700-800 Kurdî amey

Uppsala di Şirnex

J. ESPAR

pêser. Kurdê salona Katedral skolan yew hetî ra bi kîn û rik î, yew hetî ra zî melul î. Komîta şewî ra yew embaz vano: "Na şew, şewa tewr girda Kurdanê Uppsala ya! Çirray ehendey Kurdî Uppsala di yew salon di nêamey tê het." Ez wexto ki firset weyneno salon miyan di geyreno. Heme cayan ra Kurdî ameyî. Helbet Kurdê ma yê hetey Maraşî hemîni ra vêşer î. Labelê şarê Mahabatî ra bigirê, hetanî şarê Silcymaniye û Beyruti, şarê Konya ra bigerî hetanî şarê Mêrdîn û Qersi, kê herkesî weynenî. Kê na salon di Kurdan zey yew millet weynenî. Heme semedo ki Kurd î hamey tiya.

Bêguman temaşekerdoxê şewî, xwi miyan di cengê Kurdistana Vakurî yanî cengê PKK û Dewleti qisey kenî. Telabanî û Berzanî munaqeşe kenî. Hewadîsî zaf î. Qorê behsê kongra HEP kenî. Atmosferê şewî politik o. Ew yew embazê Mehabatijî weyneno, haldê yê ra aseno ki zaf bê keyf o. Ma yewbinan persenî. Embazo Mehabatij mi rî behsê kîştîşê serekê PDK Îranê û embazanê cê keno û vano:

-Ti çend vacî ez ehendey decawo. Neyarê ma bêbav î. Wehşî yî wehşî keko. Labelê ez xwiver zî kuweno. Ma çirî nê firsetan danî neyaranê xwi? Ma qey neyaranê xwi nêşinasnenî? Serekê ma ganî hezey serekan şarî hereket bikî, ganî xwi bipawî û mi-hafeze bikî. Programê şewî vernî ra hetanî peynî Şirnexî ser o yo. ERNK ra di embazî (yew Kurdî û yew zî Tirkî) qetlîamê Şirnexê ser o qisey kenî. Embazo ki Kurdî qisey keno vano:

-Dewleti bi nê qetlîamê waşt hem şarê ma ra û hem zî gerîla ra vaca: Eke şima berzî qereqolan û taburandê ma ser û eskeranê ma bikî ma zî, do şaristan û qezayanê şima bidî tank û topan ver hu xirabe bikî. Ê ebe inhewa Dewleti waştinî gerîlay fek lej ra veredî. Hedefo diyinî şaro sivil bi. Bi nê qatli-

amê sivilan ra vatinî, şima destey gerîlayan bigirî, ma zî do şima bikî. Labelê hesabê Dewleti hezey hergû ray, na ray zî şaş vejîya. Şarê Şirnexî, Şirnex ra vejîya û no provakasyonê Dewleti eşkere kerd. Dîna xwi hesnay. Di ningê dewleti kerdî yew sewl. Ê gerîlayan zî cengê xwi hina xurt û geş kerd. Dewletey Tirkan yewna ray çimandê heme dîna ver di risênay bi.

Reîsê Belediye Kerboranê zî, zey mêmânî çend deqey qisey kerdî. Reîsî qisekerdişê xwi di zafîney Kurdan di Uppsala ser o vindert û va:

-Ez wexto ki amewo tiya cylekan behsê tayn kesan kerd ki mi çirray namey yîni



nêşnawiti-bi. Tira pey mi zî yîni ra qorê dî. Mi yîni ra va, eke şima PKK begom nêkenî, de bêrê şima yay ra hewlêr bikê, ma do şima dim a bêrî! Labelê şima ha Uppsala di ronîştî û kar û girwedê xwi ewnênî û şima xwi ra

vêşer yewerî temsil nêkî, ay wexto heqê şima çinî yo ki şima ehendeyî vêşî qisey bikî!

Gelek deyîrdaz û sazband û grûbê folklorî bibî mêmânê şewa Şirnexî.

Înênan ra çend grûb nê bi: Koma Meya Farqîn (folklor), Koma Bêrivan (muzik û folklor), Koma Sefkan (folklor û muzik), Birîndar, Diyar, Beşîr Botanî û Zana.

Şewanê Ewropa di edet o, peyniya şewî di, temaşekerdoxê şewî, heme dekwenî tê dest û govend gênî. Eylekan na şewî zî, govenda Şirnexîjan girewti. Şirnex bi govendey xwi, Şirnex bi qehremaney û canmêrdey xwi bi mêmânê Kurdanê Uppsala.



Neqir



Gelo wê şehîdbûn bibe
nesîbê min jî?

Musa Anter

TÎR



Musa Anter

Çinara min

Erê, Kurd nexwendî ne, lê kultureke wan ya bav û kalan heye. Hedîsek Mihemed heye dibêje: "Wê rojek bê ferdên umeta min wê ji pêxemberên Benî Îsraîl zanatir bibin. Ez niha li umeta Mihemedî ya Kurd dinêrim, ez dinêrim ku bi hezaran ê wek Îsa, Mûsa Dawid, Silêman, Şit û Mit hene. Tewer gundê min Stilîlê bê henek gundekî epîk û artistîk e. Ez nikarim bêjim filozof in, lê gelek insanên ecêb tê de hene. Gelek caran di zanatiyê de min diheyirînin.

Di 1951 ê de, ez çûm gund, min çinarek çand. Niha bûye du metro û nîv qalind û 50-60 metro jî bilind bûye. Jixwe min divê ez tirba xwe di bin de çêkim. Wê salê min nêrî ku terhik (şax) ji ber çûye. Hecî Mehmûdê Stilîlî bangî min kir û got: "Şêxo wer ez tiştêkî pêş te bikim." Bi Kurdî navê min ne Musa ye, Şêxo ye. Ez çûm, Mehmûd ew terhikê pêş min kir. Û got: "Tu zanî çî hat bîra min?" Min got: "Çî hat bîra te?" Got: "Ez dibêjim tu wek vê çinarê yî û ev telebên me yên li çolê wek vê terhikê ne, ji ber te çûne."


Di 1951'ê de ez çûm gund min çinarek çand. Niha bûye du metro û nîv qalind û 50-60 metro jî bilind bûye. Ji xwe min divê ez tirba xwe di bin de çêkim.

Ez keniam, min xwe da vî alî û wî alî, belkî ji tîrsa jî be, lê min nêrî ku xebera wî ye. Îca ez terhik ji ber kîjan çinarê çêbûme? Ew çinar, niha hişk bûne, ez mame. Dibe ku ez jî hişk bibim terha ku ji ber min çûye bibe çinar. Ez ji ber Cîgerxwîn çûm, ji ber Celadet Bedirxan çûm û yên din. Niha li dinyayê, agirê olimpiyadê heye. Dibêjin berê, di Yewnana qedîm de lîstikek wan hebû. Agir pêdixistin, xort dibezîyan, xortekî agir dida destê yê din. Bi vî awahî bi hezaran xort ew çira didan destê hev û heta ku bigihana Akrepola armanca xwe.

Îşê miletan jî wiha ye. Yek nikare ji cihê cih meşala xwe bigihîne Akropolê. Divê mirov bidin dest hev û kes nikare bê çima yên pêşî agirê xwe negihandin hedefa xwe. Na ew tiştê ku jê hat kir, êdî bar ket stuyê yê din û bi vî awahî wê bigihên armanca xwe. Ez vê ji xortên Kurdan re dibêjim. Carna xortên xwîngerm ji min re dibêjin: "Ma kalo ka we çî kiriye?" Me ji sifirê dest bi vî îşî kiriye. Rojekê min ji yekî re got: "Lawo Xwedê we bihêle, erê we ji sifirê dest pê kir lê, heta ku me ji bin sifirê doza we anî sifirê emrê me derbas bû.

Ez niha dinêrim xortên me roj bi roj dibin wek atletên Olimpiyadê. Helbet ev hereketa wan min jî dike wek yekî ji wan xortan. Erê ez nikarim wek wan bibezim, lê bi rûniştî be jî ez bi wan re me. Qafdeyek misilmantiyê heye. Dibêjin ku hûn nikaribin ji piya limêj bikin rûniştî bikin, hûn nikaribin rûniştî bikin razayî bikin û ku bi razayî jî ji we neyê bi çavan bikin.

Ez vê tînim ser doza Kurdan, kesê ku tiştêk jê neyê tune ye. Ji piya, rûniştî, razayî û bi çavan. Hinek karin ji piyabikin, hinek karin, wek min rûniştî bi nivîsandinê bikin, hinek karin bi peran bikin û yên ku ev hemû jî, ji wan neyê, karin dua bikin. Lê xayintî nabe. Dibe, wek yekî ku bi çavan jî limêj neke, lê kufriya bike. Îca ew jî dibe kafir. Êh di temamê dînan de jî, qetla kafiran helal e.



MUSA ANTER: "Ev helbest li ser bihîstina mirina min hatiye nivîsandin. Di Nîsana 1990' de li Diyarbekir ez hatime girtin. Li welat bû dengî ku Tirkan bi îşkencê ez kuştîme. Şairê Kurd JÎR, li ser vê yekê ev helbest nivîsiye."

Apê Şêxo

Îro xûz im pîrr melûl im
Lew min bihîst ew reş xeber
Bi bîranînên te mijûl im
Tu ji bîr nabî ey xweş rêber.

Tu namirî, tu li her der
Apê Şêxo Musa Anter.

Te pîrr zilm û zor kişandî
Wek xalîça niqîşandî
Bûyî darê pelweşandî
Te li min xwîn kir dil û

ceger

Tu namirî, tu li her der
Apê Şêxo Musa Anter

Dil û ceger li te arandin
Li heps û zîndan

gerandin

Navê te bê nivîsandin
Bi tîpên zêr li ser mermer

Tu namirî, tu li her der
Apê Şêxo Musa Anter.

Ji bo welat por sipî kir
Ji gelê Kurd pîrr hêvî kir
Te çîyan bi dar û devî kir
Bi te çêbûn ev dar û ber

Tu namirî, tu li her der
Apê Şêxo Musa Anter.

Şop û rê li me girtibûn
Rê û rêber tev sitirbûn
Em bê xwedan û xwedî bûn
Te rê vekir çêbû tevger

Tu namirî, tu li her der
Apê Şêxo Musa Anter.

Ji bîr nabe xebata te
Bê esil in bikin seba te
Bûn hesreta civata te

Li nav bexçê tije hinar

Tu namirî, tu li her der
Apê Şêxo Musa Anter

Ew Ferheng û Birîna Reş
Ew zanahî û çanda geş
Bi kêf û şahî ew peyva xweş
Qet ji bîra min nayê der

Tu namirî, tu li her der
Apê Şêxo Musa Anter

Stilîlê bê te nexweş e
Çinarê bê te pel weşa
NÛŞER DÎLAN bi te geş e
Ji te stand çand û huner

Tu xuya yî, tu li her der
Apê Şêxo Musa Anter.

Jîr Dilovan

KURDÎNO RABÎN!

Apê Musa piştî bûyerên Newrozê di Welat de (hejmar: 6) wiha dinivîst: "Bajarên Kurdistanê! Em hemû rabin ser lingan, wê me têxin kîjan hepsê? Talî wê îş bê vir. Ma gelo Tirk hîn jî yeqîn dikin ku, em 20 milyon Kurd êdî di welatê xwe de bênamûsiyê qebûl bikin."

Musa Anter, di 74 saliya xwe de, gihîste xwestek û dilovaniya xwe. Ew bi vê şehîdiya pîroz, careke din TÎRa xwe, di dilê dijmin de çikand.

Dijmin, bi baweriya tunekirinê Apê Musa kuşt. Gelo dê çawa gulleyeke xayînê ve çinara azadiyê ji me

bistîne? Dê çawa bi kuştina Apê Musa, rê li ber têkoşîna wî bê girtin? Gelo ew jî nizanin ku wan ne Apê Musa, belê xwe tune kirin?

Îro bi milyonan nevi û zarokên Apê Musa, di rêça wî de, bi serfirazî dimeşin. Ew çirûskekî bû ku, agir veda. Dê zarok û neviyên

wî heta roja azadiyê vî agirê şoreşê xurt û tim û tim geş bigirin. Dê di roja serfiraziya şoreşê de, stêrkek li govendvanên dora agir temaşe bike û wê bibêje: "Aferîn, aferîn ji we re. We agir ne temirand. Îro di vê roja pîroz de, êdî ez baş zanim ku hûn zarok û neviyên

min in. Ez we pîroz dikim"

Belê, Apê Musa bi xayîni û qeleşî hate kuştin. Belediya Diyarbekirê, ji bo di festîwala çand û hunerê de, pirtûkên xwe ji bo xwendevanên xwe îmze bike gazî Apê Musa kiribû. Hê di destpêka amadekariya çûna xwe de, gelek asteng derxistin pêşiya wî. Cara pêşî di peyabûna vapûrê de, polis ew sekinandin.

Li gor îdiaya wan, îxbarek hatibû kirin ku, di vapûrê de, bombe heyê. Ji rabûna balefirê re, wextek hindik mabû, lê polis rê ne dida rêwiyan. Apê Musa ne li balefira xwe, lê bi kotek li balefireke din siwar bû ku, diçû Enqerê. Li Enqerê jî, ji Diyarbekira xopan re, balefir nîn bûn. Ji mecbûrî bi balefireke din berê xwe da Meletê. Li Meletê jî, bi erebeyekî çû Elezîzê. Êdî derengê şevê bû. Lê Apê Musa jî, bi biryara gihîştina Diyarbekirê derketibû rê û di viyabû ku, bigihê ve bajarê

şewitî. Û bi texsiyekê xwe gihande zarokên xwe yên li Diyarbekir. Ev bû Apê Musa. Zarokên wî li benda wî bûn, lewre tebat pê nediket.

Êvara 21'ê Îlonê saet li doîra 19.00 an, telefonêkî tê otela ku lê dimîne. Ew û Orhan Miroğlu bi hev re derdikevin. Li ber derê otelê texsiyekî li hêviya wan e. Lê siwar dibin ku, biçin cihê ku jê telefon hatiye. Şofêrê texsiyê, pêşî ew bi riyeke din ve dibe. Apê Musa pê re dixeyide û erebe vedigere. Li hêla Seyrantepe li kuçeya 36 an, wan peya dike û ji wan xwe dûr dike. Dawî li wan vedigere û wan gullebaran dike. Apê Musa bi 4 gulleyan birîndar dibe, Orhan Miroğlu jî 2 gulle lê dikevin. Apê Musa li riya nexweşxanê şehîd dikeve, Orhan Miroğlu jî, bi birînen dijwar digihê nexweşxanê.

Apê Musa, ji gihîştina Diyarbekirê heta kuştina xwe, tim di binê taqîba polîsan de bû. Ew biçûna ku derê polis li dû bûn. Lê, li cihê bûyerê tu hisa polîsan nedihat. Ji rojnameya "Diyarbakır Söz" 3 nûçevan, ji bo xwe bigihînin cihê bûyerê derdikevin rê. Lê, li nêzî cihê bûyerê, ji alî polîsan ve tene revandin û heta Meletê dibin. Armanc, ji cihê bûyerê dûrxistina nûçevanan e. Lewre naxwazin tu kes germe germ van cî-nayetan bibîne.

Dagirkerên hov û xwînxwar, cendekê Apê Musa jî, direvînin û dibin li gundê Zivingê, bêyî ku wecîbeyên îslamî pêk binin û li dijî a-detan vedîşêrin.

Lê, Apê Musa, cihê mezêlê (gora) xwe tesbît kiribû. Wî dixwest ku, li gundê Stîlîlê, di binê wê çinara ku wî bi destê xwe çikandibû bê veşartin û divê ew li wirê bê veşartin.

Alîkariya bi şert

Hikûmeta Alman, alîkariya leşkerî ya ku bi Tirkiyê re dikir bi hinek şertan (mercî) ji bo ku, dîsa bike ambargoyê hilanî.

Li gorî daxuyaniya Wezîrê Parêzî ya Alman Volker Rühe, alîkariya leşkerî li gorî demokratîkbûna rejîma Tirkiyê wê bê kirin.

Domandina alîkariyê li gorî agahiyên Komîsyona Parêzî ya Meclîsê wê bê kirin an jî sekinandin.

Di vê çarçoveyê de niha 46 balefir (teyare) ên fantom ji Tirkiyê re tê şandin. Di pakêta alîkariya leşkerî de, hin çekên (silêhên) leşkerî yên giran mîna 131 topên tankan, 20 tankên ji modela

M-48 û hwd hene.

Hikûmeta Alman alîkariya ku di çarçoveya NATO yê de bi Tirkiyê re dikir ji ber bûyerên Newrozê dabû sekinandin. Lewre di qetlîamên Newrozê de çekên Almanan hatibû bikaranîn.

Ji alî din ve televîzyona Alman SAT-1 di programa bi navê "Akut" ya 24 ê îlona 1992 an de, da xuyan ku dîsa di qetlîama Şirnexê de çekên Almanî hatiye bikaranîn. Ev televîzyon, li ser qetlîamên Newrozê jî sekinibû û weşanên wê li ser hikûmeta Alman bandûr (tesîr) kiribû. Heta hikûmeta Alman ambargo danîbû ser alîkariya leşkerî ya ji bo Tirkiyê.

ROJEVA WELÊT



SOND BI NAVÊ KURDISTANÊ

KOMBÛNA BÎRANÎNA APÊ MUSA

Roja 25' ê Cotmehê saet li 13.00 an, li devê deriyê rojnameya me, ji bo bîranîna Apê Musa, zêdeyî 500 rojnamevan, nivîskar û rewşenbîr civiyan. Di vê kombûna bîranînê de serokê "Komîteya Pêdaktîna Demokratîk" (Demokratîk Girişim Komitesi) Ali Beyköylü, li ser girîngiya yekbûna hêzên demokratîk belavokek xwend. Dû re xebatkarên rojnameya Welat, li ser navê rojnameya Welat û li ser navê malbata Apê Musa du belavok xwendin. Piştî xwendina van belavokan, zêdeyî 500 mirov, bi sloganên heta rojnameya Yêni Ülke meşîyan. Ji wir jî dîsa ketin rê û bi beşdarbûna hin rewşenbîrên din, ta devê deriyê rojnameya Özgür Gündemê meşîyan. Em belavoka Welat li jêr pêşkêşî xwendevanên xwe dikin.

Sonda bi navê Kurdistanê!

Îro li Kurdistanê, hêzên dewletê şerekî qirêjî û bê qaîde li hember têkoşîna gelê Kurd dimeşînin.

Bi xurtbûn û dorfirehbûna tevgera gerîlayên azadiyê, dewlet roj bi roj şaş dibe û dipelişe. Ji bo ku, xwe ji vê rewşa dijwar xelas bike û tevgera gerîlayên azadiyê bide sekinandin, kirinên derveyî mirovahiyê diceribîne; gund û bajarên Kurdistanê bombe dike, zarok û jinan dikuje û li Tîrkiyê jî şoreşgerên Tirk, di malên wan de qetil dike.

Lê, bi vê jî tîr nabe, vêca dest bi kuştina rojnamevan û nivîskarên Kurd ên pêşverû dike.


Di van mehên dewî de, ji dehan zêdetir rojnamevan hatin qetilkirin. Ê dawî jî, çinara azadiyê û dildarê serxwebûnê, Apê me Musa bû.

Bi qetilkirina van rewşenbîran, dewlet dixwaze çavê gel bitirsîne û rê li têkoşîna neteweya Kurd bigire. Lê, bila baş bê zannî ku, ên di vê riyê de têkoşîn dikin, jixwe mirina xwe dane ber çavê xwe û bi gelê xwe ve, wek goşt û hestî hatine girêdan.

Bi kuştina rewşenbîran, dîroka gelan jî nîşanê me daye ku, tevgerên azadiyê nayên sekinandin. Bi kuştina her rewşenbîrekî bi hezaran rewşenbîrên din, bejin davêjin û têkoşîna hin xurttir û geştir dikin.

Dema nivîskarê me Huseyîn-Denîz hate kuştin Apê Musa wiha gotibû: Huseyîn lawo, ez xalê te me, bila çavê te li paş nemîne, ezê ji dêl te ve jî binivîsim."

Em jî niha li vir soz û peymanê didin: Apê Musa Apê me, sonda me bi navê Kurdistanê ye ku, em qeleta te li erdê nahêlin.



PÊNÛS

Amed Tigrîs



Kurtenêrînek li ser rêzimana Kurdî

Amed

Eger Bazîl Nikîtin Maurîzio Garzonî, Fileyê Îtalî, bavê kurdnasiya Ewrûpayê dibîne em dikarin wî mîna bavê rêzimana Kurdî jî bibînin. Maurîzio Garzonî şandiyarekî File yê olparêz bû. Di sala 1762 an de çûbû herêma Mûsilê, pişt re, çûbû li Amêdiyê nêzîkî bîst salan rûniştibû. Amêdiyê, hingê paytexta Mîrîtiya Behdînan bû. Di vegera xwe de, M. Garzonî pirtûkekê bi sernivîsa, "Grammatica e Vocabolario della lingua Kurda" (Rêziman û ferhengoka zimanê Kurdî) li Romayê, di sala 1787 an de belav dîke. Tê de, hin bingehên rêzimana Kurdî û ferhengokê datîne.

Pê re, şandiyarê Balî, G. Hörnle, ew jî di çûna xwe ya Kurdistanê de, bayxê dide zimanê Kurdî û hin lêkolînên zimannasî bi sernivîsa "Über ihre Reise nach Urmia und einigen andern Kurden-distrikten im Westen dieser Stadt" bi E. Shneider re di kovara Baserler de, di sala 1836 an de dide belavkirin. G. Hörnle, cara yekemîn Încilê wergerande zimanê Kurdî, zaravê Mukrî.

Di nivê sedsala nozdan de, E. Rödiger û A.P.Pott lêkolînan li ser zimanê Kurdî didine belavkirin. E. Bérésine, profesorê zimanê Tirkî, li Zanîngeha Kazanê, çend lêkolînan li ser zimanê Kurdî û zaravayên wî amade dîke û jî aliyê Zanîngehê bi xwe ve, di du bergan de, bi sernivîsa "Recherches sur les dialectes musulmans, II, Recherches sur les dialectes persans" (Lêkolînin li ser zaravayên Musulman II, lêkolînin li ser zaravayên Farisî) tê çapkirin. A.Chodzko, li Parîsê, zimanê Kurdî xistibû nav karên xwe û li ser zaravayê Silêmaniyê di kovara Le Journal Asiatique de xebatên xwe bi sernivîsa "Etudes philologiques de la langue Kurde" (Lêkolîninên filolojî li ser zimanê Kurdî), belav kiriye.

Di dawîya sedsala nozdan de, gelek zana û rojhilatzanên Ewrûpî, xebatên girîng li ser ziman, zarava û rêzimana Kurdî dikin, wekî: P.Lerch (1828-1884), Fr.Müller, Samuel A. Rhea, Ferdinand Justi, A. Houtoum-Schindler, Eugen Prym, Albert Socin û Hugo Makas.

Di sedsala bîstan de, Iranzan û rojhilatzan bayixeke bêtir didine zimanê Kurdî û zaravayên wî. Albert Von Le Coq xebatekê bi sernivîsa "Texte Kurmângi erzählungen und-Lieder nebst einer zâzâ-erzählung," li ser zaravayê Kurmancî û Dimilî, li Berlînê, di sala 1903 an de, dide belavkirin. Arkeologê Frensî, Jacques de Morgan, jî Kurdistana Rojhilat dizivire û xebatekê li ser za-

ravayên Kurdî, bi sernivîsa "Mission scientifique en Perse, Tom V, Etudes linguistiques, dialectes Kurdes, langues et dialectes du nord de la Perse" (Mîsiyoneka zanistî li Pêrsê, Tom V, Lêkolînin zimannasî, zaravayên Kurdî, ziman û zaravayên Bakurê Pêrsê), dide belavkirin.

Zanayê Almanî, Oskar Mann, di çûna xwe ya Îranê de, lêkolîn li ser zimanê Kurdî amade kiribûn. Piştî mirina wî, di sala 1906 an de lêkolîn di pirtûkekê de bi sernivîsa "Die Mundart der Mukri-Kurden, Teil I, Grammatische skizze, texte in phonetische und persischer umschrift", li Berlînê hate



Celadet Bedirxan

çapkirin.

Erly Bannister Soane, Brîtanîyê ku xwe bi navê Musulmanekî li Mîopotamiyayê veşartibû, rêzimanekê Kurdî, "Grammar of the Kurmanji or Kurdisg Language" (Rêzimana Kurmancî, an jî ya zimanê Kurdî), li Londonê, di sala 1913 an de, û yeka dinê jî, bi navê Elementary Kurmanji grammar" (Rêzimana Kurmancî ya destpêkî), li Bexdayê, di sala 1919, belav dîke.

Şandiyarê Amerîkî, L.O.Fossum, li ser zaravayê Mukrî rêzimanek bi navê "A practical Kurdish grammar" (Rêzimanekê Kurdî ya pratîk), amade kir û di sala 1919 an de çap kir.

Di sala 1926 an de Fileyekî Keldanî, jî Mûsilê, navê wî Paul Beider, rêzimanekê kurt bi sernivîsa "Grammaire Kurde, "Dialecte de Mousul" (Rêzimana Kurdî, zaravayê Mûsilê), li Parîsê, çap dîke.

Di sala 1939 an de, Îranzanê Danmarkî, Arthur Christensen, xebatên F.C.Andreasen li ser zimanê Kurdî, li Berlînê dide hev û dide weşandin

KURDNASÊN KURD

Cara yekemîn rêzimana ku ji aliyê Kurdekî ve hatiye nivîsandin a Seid Sidqî Kaban e. Sernivîsa pirtûkê "Muxtesîrî serf û nehiwê Kurdî" bûye, di sala 1928 an de, li Bexdayê, belav bûye. Salekê pey re, Tewfîq Wehbî "Destûrî zimanê Kurdî" belav dîke. Çapeke dinê jî, jî vê rêzimanê bi zimanê Erebî bi sernivîsa "Qewa'îd

el-Luxe el-Kurdiyen", sala 1956 an de, tê weşandin. Di pey T.Wehbî re, di sala 1956 an de, Nûrî Elî Emîn, jî bo xwendekarên Kurd rêzimanekê, sernivîsa wê "Qewa'îdî zimanî Kurdî le Serf û Nehiw", belav dîke. Ela'îdîn Sica-dî jî, bala xwe dide ser zimanê Kurdî û nivêrêzimanekê di sala 1962 an de, belav dîke Sernivîsa wê "Destûrî ferhengî zimanî Kurdî" ye. Wê demê, sala 1961 an, Cegerxwîn diçe Kurdistana Başûr û mamostetiyê dîke. Di ber re, vê rêzimanê "Awa û destûra zimanê Kurdî" çap dîke.

Li Kurdistana Başûr-Rojava, di salên siyan (30) de, Hawar (1932-1943) derdikeve û Celadet Bedirxan çend şax ji rêzimana Kurdî, di hejmarên 16, 17, 18, 25, 26, 27, 28, 29, 30, 31, 32, 33, 34, 35, 40, 42, 43, 44, 45, 46, 47, 48, 50, 51, 53, 54 de belav dîke. Piştî Celadet Bedirxan, Reşîdê Kurd, di sala 1956 an de, "Rêziman a zimanê Kurmancî", dide belavkirin.

Sala 1961 an, D.N.Mackenzie, pirtûkekê bi du bergan li ser zaravayên Kurdî, bi sernivîsa "Kurdish Dialect Studies" li Londonê çap dîke.

Di sala 1965 an de, cara yekemîn rêzimanekê Kurdî, li Kurdistana Bakur hate belavkirin. Rêziman a Senatorê Rûhayê bû, navê wî Kemal Badilî, sernivîsa rêzimanê "Kürtçe Grameri" bû.


Li Amerîka Ernest McCarus, li ser zaravayê Silêmaniyê pirtûkekê di sala 1958 an de amade dîke, sernivîsa wê "A Kurdish grammar, descriptive analysis of the Kurdish of Sulaimaniya-Iraq" (Rêzimana Kurdî, şikirineke tehlîlî ji Kurdiya Silêmaniyê re, Iraq) ye. Pey re, E. MacCarus bi J.J.Abdullah re "Kurdish Basic Course, Dialect of Sulaimania" (Fêrên bingehîn ên Kurdî, zaravayê Silêmaniyê), di sala 1967 an de, belav dikin.

Di salên 70 yan de, Korî Zan-yarî Kurd bayixeke baş dide xebatên zimannasî. Komîteke jê re tê avakirin, navê wê "Lijney Ziman û Zanistekane", û berhemên xwe di Kovara xwe de didine belavkirin (1).

Piştî mirina Celadet Bedirxan, Kurdzan Frenî, Roger Lescot, di sala 1970 ê yan de rêzimana xwe û C. Bedirxan bi Frensî, bi sernivîsa "Grammaire Kurde" (dialecte kurmandji) belav dîke.

Êdî, di warê rêziman û zimannasiya Kurdî de, pîr xebatên hêja, jî salên 70 û vir ve hatine kirin, mirov dikare wan di dîrokrêziya rêzimana Kurdî de bibîne.

1. Li Kurdistana Başûr, gelek kar di warê ziman de hatiye kirin, wekî dinê çavkanî ne di destên me de ne ku em li ser bisekinin.



Huseyîn Denîz di derheqê serpehatiyên xalê xwe Musa Anter û Qedrî Cemîl Paşa de nivîsîbû.

Ji xwarzî Huseyîn Denîz ji bo xal Musa Anter

Ew xal û xwarzî, ew herdu kezêbşewi-tiyên welatê xwe, ji bo çand û zimanê Kurdî, wek çem û kaniyan bûn. Ew herdu nivîskar, rojnamevan û mamoste, ji bo gelê Kurd û Kurdistan xezîna zanîne; di pêşveçûna hêjahiyên mirovahiyê de jî, du sembolên hemdemiyê bûn.

Huseyîn Denîz

Rêber, rewşenbîr û serokên tevgerên neteweyî yên Kurdan, mezin û têkoşerên Kurd, nivîsandina serpehatiyên xwe ji xwe re, nekirine xebatên girîng. An jî nivîsandina bîranîna serpehatiyên, girîng ne dîtine. Belkî jî, şertên jiyana wan îmkana nivîsandinê nedaye wan. Di vî warî de pirtûk ewqas hindik in, mirov kare bi hêsanî wana bi hejmêre. Pirtûkên serpehatiyên in: Doza Kurdistan-Zinar Silopî (Qedrî Cemîl Paşa), Dr. Nûrî Dêrsimî-Di Dîroka Kurdistanê de Dêrsim (Kurdistan Tarihinde Dersim) û Serpehatiyên Min (Hatıralarım.) Bi Kurtî Jîna Min (Muhtasar Hayatım-Ekrem Cemîl Paşa, Serhildana Çiyayê Agirî-İhsan Nûrî Paşa, Serpehatiyên Min (Hatıralarım)-Musa Anter, Bekle Diyarbekir-Mehdî Zana, Hêviya me ji rêber û mezinên me ew e ku tevde serpehatiyên xwe binivîsinin û bi nivîsandinên xwe riya me ronî bikin.

Doza Kurdistan, pirtûkeke

bîranîne ye, di pirtûkê de têkoşîn, berxwedan û serhildana Kurdan a 60 salan heye. Nivîskarê pirtûkê Qedrî Cemîl Paşa ev 60 sal bi çavên xwe dîtîye, jîna wî di nava wî 60 salî de buhuriye. Ji xwe pirtûk jî serpehatiyên wî bi xwe ne. Di Doza Kurdistan'de berê bi kurtayî Kurd û Kurdistan dide naskirin. Paşê jî civînek, komele û tevgerên Kurdan, Serhildana Şêx Mehmedê Berzencî, Koçgirî, Smail Axayê Simko, Şêx Seîd, Agirî, Dêrsim, Tegera Xoybûn û Komara Mehabadê çawa bûne, kûr û hûr hatiye nivîsandin.

Çapkerê pirtûkê Mehmet Bayrak jî, bi notên xwe ev pirtûka hêja pîr edilandîye. Mehmet Bayrak 45 rûpel not nivîsiye li ser pirtûkê. Bi notên Mehmet Bayrak, Doza Kurdistan hin bêtir tê fam kirin. Ji bo vê yekê hewldana Mehmet Bayrak jî bi kêmanî wek pirtûkê xebatek hêja ye.

Serpehatiyên Musa Anter jî bi navê Hatıralarım derket. Pirtûka Mûsa Anter jî wek pirtûka Doza Kurdistan bi Tirkî ye. Hatıralarım jîna Musa An-



Apê Musa, Huseyîn Denîz, Celilê Celil, İsmail Beşikçi û Mustafa Reşit di dema vebûna Enstîtuya Kurdî de.

ter e, beşek ji jîna welatê me ye. Di pirtûkê de, ji çêbûna nivîskar heta îro tevgera wî ya neteweyî hatiye nivîsandin. Girtin û mehkeşên nivîskar Musa Anter, çend şexsiyetên Kurdan û hevîskirina wan, rojname û kovarên Kurdî, tevgerên Kurdî giş di pirtûkê de hene.

Hatıralarım bi Tirkîyeke hêsan hatiye nivîsandin. Herkes kare pirtûkê bixwîne û jê fam bike. Lê daxwaza me, divê ev pirtûka hêja jî, wek pirtûka Doza Kurdistan û yên din bi Kurdî jî derkeve. Jixwe nivîskar Musa Anter jî, di pêşgotina xwe de vî sozî daye me xwendevanan. Em dixwa-

zin rojekê berî rojekê serpehatiyên Musa Anter bi zimanê Kurdî çap bibe.

(Doza Kurdistan Qedrî Cemîl Paşa, 318 rûpel, weşanên Özge, 1991)

(Hatıralarım, Musa Anter, 250 rûpel, weşanên Doz, 1990)



Em pênuşa mamosteyê xwe Musa Anter naxînin erdê. Hêzên mêtîngehkar û hêzên wan ên tarî, têkoşîna me ya zanyarî, çandî û hunerî nikarin rawestînin. Dê pênuşa mamosteyê mezin riya me ronî bike.

**Rewşen
Enstîtuya Kurdî
Weqfa Çanda Kurdî
Navenda Çanda Mezopotamya**



EW MEZÎNÊ ME BÛ MAMOSTEYÊ ME BÛ

Ew tîrêja têkoşîna biratiyê, evîniyê û azadî ya li Kurdistanê bû. Piştî qirkirina Şêx Seîd, Agirî, Zilan û Dêrsimê, wî meşaleyê azadiyê jî nû ve vexist. Ew Ehmedê Xanî yê hemdem bû.

Wî di jiyana xwe ya dirêj de, pênuşa xwe weke şûrê azadiyê bi kar anî. Di têkoşîna li hember dagirkerên faşist de, xwest wan jî, hîni insanetî, biratî û evîniyê bike. Lê mixabin hêzên dagirker, nikaribûn hîni van xesletên insanî bibin. Dê ew zarokên barbarên Tîmûrleng û Cengîzhan çawa hîn bibûna?

Di dema ku gotina Kurd û Kurdistanê qedexeyê bûn, Apê Musa bi rojnameya "İleri Yurt" li Amedê çira azadiyê vexist. Di huçra mirîne de, Birîna Reş nivîsî û di kovar û rojnameyan de, bi sedan gotar nivîsî û bû kelem di çavên neyaran de.

Weke di bîranînen xwe de jî gotîye, ew şahid, girtî, mehkûm û dozvanê dema xwe bû. Ew enternasyonalîstekî rast û bi bawerî bû. Wî di têkoşîna xwe de, di dema ku dewleta dagirker, bi çapemenî û televîzyonên xwe ve, dixwest ku mejiyê gelê Tirk, Laz, Çerkez û Kurd felc bike, wî derdê evîni, dostanî û aşîtiyê hîni wan gelan dikir. Wî di tu demî de, ji ramana xwe tawîz neda dijmin. Wî weke gerilayekî enternasyonalîst jiyana xwe domand. Ew nivîskarên kemalîst û faşîst, ku bi salan pê re dijminatî kirin, îro birêziyên xwe pêşkêş dikin û mezinahiya wî îtiraf dikin. Pênuşa Musa Anter jî bo yekîtiyê û biratiyê, bi salan weke çirayê veket. Dê ebîdiyên di têkoşîna gelên bindest û gelê Kurdistanê de bijî.

Musa Anter rêberê têkoşîna me ye. Ew şan û şerefa me ye. Bila serê gelê me sax be.

MALBATA ANTER

Çîn ji koletiyê bû gel

Çîn, ne tenê ji bo xelasiya civakî, lê, ji bo xawêna (şeref) mirovahî û ji bo têkoşîna kesani û nasnameya xwe serî rakir, şerekî bi sonda mirinê kir. Ji koletiya ku bi milyonan kes ji birçibûnê dimirin û dest ji imperyalîstan re vedikirin û weke koleyan dixebitîn û ji tariya sedsala navîn, gelekî rizgar û serbixwe afirî.

Faik Bulut

Komara Gel a Çînê, di 1949 an, yekê meha Cotmehê de ava bû. Partiya Komunîst a Çînê, bi pêşengiya serokê şoreşger Mao Zedung, bi şerekî dûvedirêj a gel ve, ji gund û pesaran bajaran zeft kir. Dû re, bi tifaqa gundî û karkeran desthelatê (îqtîdarê) standin. Bi vî awayî jî, ji çara yekê nifûsa dinyayê kete binê bandûra sistemeke sosyalist.

Li Çînê çi bû? Bersiva vê pirsê, ji bo şoreşa Kurdistanê

jî, rênîşandaneke girîng e.

Çîn, navendeke bajarvaniyê yê herî kevn e. Beriya Zayînê, bi hezaran salan, ev welat, welatekî xwedî çandê dewlemend bû. Lê, ji sala 1700 an pê ve, bi mêtîngê-kariya kapîtalîzma Ewrûpî, ku berê xwe dabûn welatên piştî behran, hate dagirkirin, talankirin û belav bû. Welatekî mîna Çînê mezin, bû mêtîngêh. Kurd jî mîna Çîniyan, li ser erdê Zagros û Mezopotamyayê bajarvaniyek girîng ava kiribûn. Li ser van erdan, gelek dewlet der

xistin holê. Belê ew jî, hatin dagirkirin û bûn mêtîngêh.

Çîn, di dema mêtîngêh-kariyê de, bi zora mêtîngêh-karên Ewrûpî, hîni afyonê bûn û bûn koleyan serte-wandî. Di pêvajoya netewebûnê de, bi milyonan mirov, bûn mîna kesên kole û bê giyan. Kurd jî, di dema netewebûnê de, bûn pênc parçe û gelbûna wan jî, qedexa kirin. Axaftina bi Çînî û çanda wan, biçûk di hate dîtîn.

Mêtîngêhkar, li wan wek mîletekî ketandî dinihêrtin. Ji wan re "Nijada zer û er-

jeng" digotin. Nasnameya Kurdan jî, bi gotinên "Tirkên çiya, Kurdên bi qemçik", an jî "Erebên çiyayî" di hate inkarkirin. Zimanê Kurdî, biçûk dikirin û dawî jî, qedexa kirin.

Çîn, welatekî çandîni yê mezin bû. Endustriya wî, bi pêş neketibû. Çîna karkeran nîn bû. Gundî jî, ji bo berjewendiyên axayan dixebitîn. Ji bo gel, ji bo netewê têkoşîn tune bû. Dîne Bûdîzmê jî, ji bo raketandina gel di hate bikaranîn. Gelê Kurd jî, ji Îdrîsê Bedlîsî û vir ve, di bin destê axa û began de, an ji bo padîşahên Osmanî, an şahên Îranî, an jî, ji bo xelîfeyên Ereban şer dikirin. Haya wan ji berjewendiyên neteweya wan nîn bû. Nikaribûn xwe ji bandûra eşretvaniyê xelas bikin. Dawî, ew gelê ketandî, li hember gelê xwe kirin cerdevan.

Lê Çîn, kaniya serhildanên gundiyan bû jî. Cihê serhildanên li dijî zilm û pestayî neteweyî ya li ser gel bû. Kurdistan jî wilo. Ji sedan salan vir ve, li hember Ereb, Ecem, Tirk û Osmanîyan gelek serhildan li dar ketine. Dîne Îslamê ku weke çek bi kar dihanîn û dixwestin Kurdan pê tîxine xewê, li xwe-diyê xwe vegeyriya û Kurd gihiştin hişê netewebûnê.

Serokê şoreşger Mao Zedung, vê girsa Çînê dît. Giyana serhildana gundîtiyê

fêm kir. Li çol û pesarên Çînê, navendên şoreşgeriyê ava kir û têkoşîn ji van deran dest pê kir. Li hember imperyalîst û dagirkeran têkoşîneke dûvedirêj da. Serokatiya têkoşîna neteweyî ya Kurd jî, vî tiştî dît û derbasî jiyane kir. Ji nav gundîtiyê, giyaneke şoreşger û xurt derxist.

Çîn, ne tenê ji bo xelasiya civakî, lê, ji bo xawêna (şeref) mirovahî û ji bo têkoşîna kesani û nasnameya xwe serî rakir, şerekî bi sonda mirinê kir. Ji koletiya ku bi milyonan kes ji birçibûnê dimirin û dest ji imperyalîstan re vedikirin û weke koleyan dixebitîn û ji tariya sedsala navîn gelekî rizgar û serbixwe afirî.

Çîn, bi ceribandînen sosyalîzmê yê dewlemend, ji bo tevgerên sosyalîst ên dinyayê jî, bû mîna keke baş. Teoriya şerê gel a şoreşger afirand. Bi vî jî, riya xelasiyê li ber welatên mêtîngêh û kole vekir. Gelên Vietnam, Qamboçya, Laos, Filîstîn û Efrîqayê, ji wan gelek tiştan hîn bûn. Di nav gelê Çîn a rizgar û gelê Kurd e, wekhevîyên gelek girîng hene. Li gor baweriya min, Şoreşa Çînê ji bo xelasiya Kurdistanê jî, mîna keke baş e. Divê em vê şoreşa ku derê xelasiyê li gelên bindest vekiriye biparêzin. Lewre riya xelasiyê ya ji koletiyê, şoreşek wilo divê.



Serokê şoreşger Mao Zedung, vê girsa Çînê dît. Giyana serhildana gundîtiyê fêm kir. Li çol û pesarên Çînê, navendên şoreşgeriyê ava kir û têkoşîn ji van deran dest pê kir.



Apê Musa

Nivîsara pênûsa te ya dijwar / Dikete çavên neyarên
Bîstê Îlonê şeva reş û tarî / Weşanan nûçe dan
"Apê Musa şehîd kirin!"
Tîrên xedar dilên me sotin / Me got: "Na ne rast e,
Apê Musa namire"

Dilxweş be Apê Musa / Ma ne tu bû yî,
ne dixwest li ser doşekê bimirî
Tu şehîdê herî mezin î. / Te çinara xwe çand
Me jî soz û peyman daye te / Em pênûsa te naxînin erdê
Bi xweşî here, gelê Kurd te ji bîr nake.

Navenda Çand û Pîşeya Hevkarî / Çolemêrgê

Sokratesê hemdem: APÊ MUSA

Kuştina Apê Musa, di têkoşina neteweyî ya gelê Kurd de, destpêka radeyeke (merheleyeke) nû ye. Ev bûyer nîşan dide ku, dijminên gelê Kurd ewqas neçar, ewqas şeperze û ewqas çavtarî bûne ku, dikarin hemû hovîtiyan bikin. Bi kurteberî, dijmin har bûye. Ev êrişên bêperwa nîşanên harbûnê ne.

Felat Dilgeş

Gelo ezê çî binivîsim, gelo ezê çî bibêjim; ma salixdana hovîtiyê hêsan e, hovîti nayê salixdan, ew tê dîtîn, ew tê jiyîn. Kuştina zarokan hovîti ye, qirkirina mirovan hovîti ye; mirovan bi saxî kirina gorê hovîti ye. Û kuştina filozofên mîna Apê Musa, hovîti yek nedîtî ye. Me Kurdan ev hovîti giş dî-

tin. Van kirinan em birîndar kirin; dilê me bi zîz, dilê me bi kul, dilê me bi birîn e. Lê, şehîdkirina Apê Musa, şehîdkirina Sokratesê hemdem? Ma ev hovîti, tê jibîrkirin? Gelê Kurd dikare vê bêbextiyê ji bir bike û bi yên ku pê ev xayintî kirine re bijî? Emê di rûpela dîrokê ya Apê Musa de çî binivîsin? Ewê zarokên me, di pêşerojê de, ji yên ku ev xayintî û bêbextiyê

bêxîretiyê nakîşîne.

Jiyana Apê Musa dîrok e; berxwedan e; enîfîrehî û serbilindiya gelê Kurd e. Jiyana filozofê nemir Apê Musa, di dîroka sed sala bîstan a gelê Kurd de, rûpeleke girîng e. Apê Musa şexsiyeteke neteweyî ye. Di gelek bûyerên girîng ên sed sala me de navê Apê Musa derbas dibe û ew di van bûyeran de xwedî rolekî mezin e.

Nizanim, emê di nasnama Apê Musa de çî binivîsin û wî, bi çî awayî bi nîfîşên nû bidin naskirin? Emê bibêjin nivîskar, emê bibêjin hunermend, emê bibêjin zimanzan, emê bibêjin dadzan (hukukçu), emê bibêjin dîrokzan, emê bibêjin rojnamevan, emê bibêjin siyasetvan... emê çawa salixê wî bidin. Bi rastî ew di tu warekî de bi şûn de nema. Ew deryayek zanyariyê bû. Lewma jî ezê jê re bibêjim Sokratesê Kurdistanî, Sokratesê hemdem, Sokratesê sed sala bîstan. Dirûvê wî û Sokrates bi hev dixist; jiyana û qedera wan yek bû. Armanca wan jî yek bû; herduyan jî, ji bo mirovatiyê têkoşin dida. Yek hat jehrîkirin, ê din bi gulên hat kuştin. Yek Grekî bû, yê din Kurdistanî bû. Demên wan jî hevdû dût, armancên wan nêzîkî hev bûn; yek Beriya Mîladê di qirnê çaran de, yê din Piştî Mîladê di qimê bîstan de jiya.

Apê Musa!...

Min nizanibû li pey te nivîsîn ewqas dijwar e. Te ji nişka ve, ev barê giran da şer piştî me û te ji nişka ve ev vatîni (peywîr, wezîfe) siparte me.


Ma malava, ma gorbihuşt, ma şehîdê şehîdan; ma te çawan vê payizê ji nişka ve, em sêwî hiştin.

Xwedê mala xayin û bêbextan xera bike. Kevir bi ser wan de bibarin

Êdî kimil nikarin genimên me bixwin

Êdî genimên me bi xwedî ne Serê xwe bi hêsanî deyne lo Apo


Bila çavê te li paş nemîne.



Jiyana Apê Musa dîrok e; berxwedan e; enîfîrehî û serbilindiya gelê Kurd e.

AZADÎ

Abdurrahman Durre



Xal an xwarzê diztir e?

Kê ji wan Musa Anter şehîd xist?

S. Biçûk

Bi dilekî şewat û daxdayî em dibêjin: Bila serê gelê Kurdistanê xweş be û dilovaniya Xwedê, Yezdanê pak li ser şehîdê nemir, rewşenbîrê kal Apê Musa Anter be. Di dermafê vî xortê heştê salî de; xameya min xwê dide, bê çarê radiweste û rê dide hêsir û kovanan da ku, agirê dil hinekî vemirîne. Belê, şervanê serxwebûn û azadiyê, mamosteyê rewşenbîran her çiqasî bi temenê xwe li qeraxê heştê salî dida, lê belê mîna xortekî çar-deh salî nû bi vejandina zîmanê Kurdî re dibîskivî, xwe bi gul û kulîlkan re di nav çîmen û daristana wê de dixemiland û bang dikir. "Ez weqfa çand û zîmanê Kurdî me." Dida qîr û hewaran tîrên wî dibûn berbanga roja nû, ji bo xayîn û mêtîngêhkarên jî, bedev, firtone û agirê dojhê bû. Çeka xwe; hevala şêst salî, xweş dizanî bû bi kar bîne û mîna tîrên jehrê arasteyî dilên derewkar, faşîst û xayînan bike. Bi lêdanên mirinê di mejiyê mêtîngêhkar, hevxebar û nokerên wan de biçikîne. Ji bo gelê xwe jî, bi helwestekî bê tîrs û cîgermend, bi rastiyeke Şoreşgerî

jehra şerê taybetî dişewitan-din û bê hîkarî dibîstîn.

Belê, Apê Musa ev şêst sal in ku xameya te li hember şerêkî gemar û qirêj, pakîya mirovhiyê û rastiya wê diparêze. Hurmiz û Ahrîman, xêr û şer, teror û aşîti, ji hêla din ve jî Tirkî û Musa Anter, her dem du polên dijhev, lê bila dinya tev bizanibe ku, gelê Kurdistanê li hember vî gunehê mezin bê deng namîne û dê tola te sed car hilde. Bê guman niha, ji nû ve çiroka (49)an a sala 1958an di karvaniyê de pêk tînin. Berî şehîdkirina te jî gelek mîrxas şehîdkiribûn, hingê digotin: "Ê ku Musa Anter dibîne Kurdîtî tê bîra wî" Ev bû gunehê te yê mezin ku, ji bo wî dixwestin te bi dar vekin, lê niha guneh bêtir bûye, eger raporê veşartî derkevin wê ve gotinê bînin zîman: "Ê ku Musa Anter bibîne, yê ku wî bixwîne dibe evîndarê serxwebûn û azadiyê, şoreş û şoreşgerî tê bîra wî." Musa her xortekî Kurd dike Mem, Siyabend û Ferhad. Neteweya Kurdî jî dike, Zîn, Xecê û Şêrin. Ev jî rastiyeke. Bi serê pozîkê xameya xwe te gora mêtîngeran dikola, pîrs jî, pîrsa mirin û manê ye. Bila çavê wan birije, destê wan

jêbibe ku hêvî ya heştê salî bi te re birin gorê, lê xwînxwarên hovane bila bizanibin ku, em ê bi giyan û raman a Apê Musa êrişên serkevtinê berdin wan.

Musa Anter şehîd ket, lê di sih milyon dil de, di her dilê Kurdekî de Musa Anterek wê bêmirin bijî, belê dijmin tu şehîdkirî lê sih milyon Musa Anter avakir û her yek mîna te wê bibe kelemê pêş çavên wan.

Têkoşerê nemir, Apê Musa! Soz û peyman, ku em çeka te, hevala riya te ya şêst salî; xame ya te û bîr û baweriyên te, di dilê xwe de hilgirin, di nav reh û gera xwîna xwe de bi tevgerînin û bi wê hêzê her dem bi ser dijmin de herin. Baxçê ku te çandiye em bi ked û xwedana xwe û her kêliya ku bê xwestin bixwîna xwe avbidin, da ku gul û kulîlkan kesk û sor û zer bîn bişkivan-din.

Xal an xwarzê diztir e? Dibêjin "Yek hebû pir diz bû, di pişeyê diziyê de çalak û jîr bû, xwedî nav û deng bû. Berî ku bimire dixwest ku xwarzê xwe hîni diziyê bike. Ji bo ku cihê wî bigire. Rojekê gote xwarzê xwe: Ez dê te hîn bikim çawa hêkan ji hêl-

ne bidizim ji bin makê û bi xwe nehise. Xal bi darê re hilperikî ku hêkan bidize. Xwarzê jî, ji bin ve derpê xalo jêkir û dizî. Dema xal ji darê daket û bi dilxweşî ji xwarzê re got: Bibîne çawa min hêk dizî û mak bi xwe nehisiya; xwarzê derpê derxist û got: Xalo! Min jî derpê ji te kir û haya te ji te nebû.

Gelo! Xal an xwarzê diztir e? Dewlet kontirgerîla, Turkeş, hizb-î dewlet... kîjan xwarzê û kîjan xal e. Kîjan jî kê tewandartir û teroristir e? Kê ji wan Musa Anter şehîd kir? Di diziya hêkan de, ne mak bi xalê hisiya û ne jî, kal bi xwarzê hisiya.

Lê bila xal û xwarzê her du bizanibin ku, em bi her duyan hisiyane, gelê me jî hişyar û baş dizane tola xwe hilîne "Di Kurdistanê de tewanek bê tole derbas nabê."

Apê Musa jî dibêje: "Bê çawa mirov ji yekî kor re bibêje tû çîma nabîni" yan jî, ji kerr re çîma deng nabi xwe." Ev dibe bê aqilî.

Belê, dewlet dîn û bê aqil e ku dixwaze me bi gotinên pûç bixapîne û teror a xwe veşêre. Em jî, ne bê aqil in ku li benda yekî dîn û bê aqil bimînin, heta ku qatîlê Apê Musa belî bike. Bila êdî xwe bixapîne ma her kes jî dizane ku ew bi xwe qatîl e.

Ji Musa

Anter re...(*)

Tu xumxuma avên çema
Tu çerx û govend û sema
Tîni di nav kat û lema
Tu jin î, hebûn î, tevger î.

Bayê sibê tê xweş tu yî,
Berfa sibê tê xweş tu yî,
Xurtî di latê xweş tu yî,
Em hişk û ziwa bin tu terî.

Giranbihayî, zêr û durr,
Tu dê û bav û xuşk û kurr,
Tu tim hebûnî xurt û gurr
Yaqût û lal û gewher î.

Pêşve diçi kar xebat,
Di nav çîyan de hîm û lat,
Pêlan didî Zab û Ferat,
Çelq û xumîn û gur- gurî.

Pîrr xurt û hêz î tu hebûn,
Tu pêşveçûn serxwebûn,
Herdem di nav damar û xûn,
Tu her hey î qet namirî

Bihîşt tu yî, agir tu yî,
Bakîr tu yî, rakîr tu yî,
Xemgînkîr û şakîr tu yî
Herdem didî tu nakirî.

Tu jin î bihar î, har û dîn,
Candar bi te herdem bi tîn,
Te daye wan ev hîlm û bîn,
Di nêv hebîne cigirî.

Ev pêti û alavî tu,
Xweş ronî û pertavî tu,
Xurt î di zendên karkerî.

Herdem heye, peyda yî tu,
Tava riwê xeyda yî tu,
Cama bi dest seyda yî tu,
Tu ol û vîn û bawerî

Kaya Müştakhan

*Ev helbest ji Diwana Cigerxwîn hatiye girtin û ji aliyê min ve hatiye guhartin.


Xwendevanên hêja; Ji ber hin sebebên teknîkî, xaçepirsa me ya heftiya çuyî pîrr tevlihev bûbû. Ji lewre ev hefte jî em careke din eynî xaçepirsê pêşkêşê we dikin. Ji ber vê tevliheviyê, daxwaza me ji we, hûn li me biborin.

XAÇEPIRS

Amadekar: Rasto Zîlanî

Çeperast: 1-Hozanê Kurd. Di sala 1927 an de, li Diyarbekir ji dayîka xwe dibe. Piştî xwendina li Diyarbekir û Ruha, li zanîngeha Enqerê, beşa zîman, dîrok û erdnîgarî dixwîne. Helbestên xwe bi tirkî dinivîsî, belê naveroka helbestên wî, li ser pîrsgirêk û dijberiyên Kurdistanê bûn. Pirtûkekê tenê weşandiye, navê wê, "Min qeydan kevin kir ji hesreta te" ye. Di sala 1991 an de, çû ser dilovaniya xwe. Di wênê de tê dîtin/ Navê şîretêkî Ingilîzan yê petrolê 2-Zindî, bi can/ Tebat 3-Sembola Îrîdîûmê/ Li Rojhilata Navîn navê welatek/ Muxtar 4-Xwegêndirandin, qulupandin/ Biryara mehkemê 5-Cihê ku genim lê dibe ard/ Bi tirkî şop, rêç/ Lehçe 6-Herf/ Notayek 7-Li Kurdistan navê eşîrek/ Cem, digel, nik 8-Fikirandin 9-Jina ku mêrê wê miribe-dev jê berdabe/ Li Îrlanda navê rêxistinek ku li dijî Ingilîzan têdikoşe 10- Ji agir radibe/ Bi zîmanê biyanî pol, sinif

Serejêr: 1-Slogangêrî 2-Li Japonya navê bajarek, Amerîka yek ji bombeyên atomê avêtibû vî bajarî 3-Sembola Mangenez/ Nebatek ku jê kinc çêdibin 4-Sererast/ Radyo û televizyona Îtalya 5-Mehkemekirin 6-Navê Îxdirê a bi kurdî/ Esîr, girtî 7-Keç/ Yên ji dê û bavekî (ji bo lawan) 8-Tenî/



Fêkiyek 9-Xizan 10-Berz, bilind 11-Cesaret 12-Pereyê ku ji bilî keaş didin karkeran

BERSIVA XAÇEPIRSA HEFTIYA ÇUYÎ

Çeperast: 1-Evdille Pêşew 2-Ser/ Tekûz/ Za 3-Ajan/ Artîn 4-Rîviera/ Dasi 5-En/ Sm/ Daimî 6-Kabe 7-Danasîn 8-Dad/ Zil 9-Êriş/ Roj 10-Lanet/ Nî

Serejêr: 1-Esaret/ Dêl 2-Vejin/ Dara 3-Drav/ Kadın 4-Vîsan/ Şe 5-Lt/ Embaz 6-Lear/ Esîr 7-Ekrad/ Îlon 8-Pût/ Adn/ Ji 9-Êzîdî 10-Nam 11-Ez/ Si 12-Wall

KARTA ABONETIYÊ

Ji kerema xwe re ji hejmara pê ve min bikin aboneyê rojnameya Welat

Nav:

Paşnav:

Navnîşan:

Bedelê abonetiye razînin:

Li Tirkîyê û li derve: Y. Serhat Bucak

İş Bankası Cağaloğlu Şub.

Döviz tevdiat Hesap No: 3113617

Ji kerema xwe re vî cihî dagirin û tevli kopyeke pelê razandina bedelê abonetiye bişînin.

Navnîşana Welat: Nuruosmaniye Cad.

Atay Apt. No:5 Kat:1 D:4 Cağaloğlu / İstanbul

Tel: 511 57 60 - 511 66 02 Fax: 511 51 57

Mercên abonetiye:

	Li hundir	Li derve
6 meh	120.000	60 DM
12 meh	240.000	120 DM

Apê Musa û zarokên wî

Apê Musa, bi mezinan re mezin, bi ciwanan re ciwan, bi zarokan re jî wek zarokê bû.

Ew, sebir û aram bû ji bo her nîşî. Her dem bi kêf û devken bû. Lê, ji bo wî zarok, xwedî cihekî taybetî bûn.

Ew wek bav û bapirê me gişan bû. Wî em giş mîna zarok û neviyên xwe didîtin.

Pirr dilşewîfî bû ji bo neviyên û zarokên xwe. Dema gerîlayek şehîd diket, hêstir ji çavên wî dibariyan, gava rojnamevanek an jî welatparêzek şehîd diket, ji xemgîniyê nikaribû biş-textile.

Dema zarokek an jî, jineke Kurd li gundekî Kurdistanê diketin rewşeke dijwar, hedan bi

Apê Musa nediket û dîsa çavên wî tije dibûn. Wek dayîkeke kezêşewîfî, dilê wî bi he-

mû zarok û mezin ên gelên bindest dişewîfî û ji bo wan çî ji destê wî dihat dikir. Zehfê wextê

wî, ji ber ixtiyariyê, di mala wî ya Maltepe de derbas dibû. Bi rastî, ew hîne rûniştinê nebû-

bû, ji xwe li mal jî wextê wî bi nivîsandinê derbas dibû. Wekî din neviyekî wî yê biçûk (2 sa-î) li cem wî bû.

Carna bi saetan bi vî neviyê xwe re dîliyîzî û pê şad dibû. Ku ne ji neviyê wî bûya, nikaribû kêliyekî di mal de bima.

Herdem behsa neviyê xwe dikir.

Digot: Neviyê min sal û nivî ye, lê dema strana Amedê ji teybê dibihîse, radibe dileyize. Dema teyb dibêjê "Amedê Serhildan e", ew jî serî hildide û dikeve govendê. Apê Musa, bila dilê te xweş be, ne dûr e ku zarok û neviyên te giş bi starana Amedê re serî hildin û Kurdistanê azad bikin.



Şehrezayî

Rojek ji rojan, roviyek di nava daristanê de derketibû geştê digeriya, rastî şêrekî bû. Şêr, jar û birçî û weke (mîna) termekî li ber siya darekê paldayî bû, rewşa wî ne xweş bû.

Rovî li derdora wî geriya, li rewş û dîmena wî hizirî (fikirî), paşê bang kire şêr û got: "Ya şahê daristanê, xuya ye rewş û dîmena te ne baş e, derdê te çî ye, ji min re bi bêje, dibe ku, ez karibim hinek yakmefî (alîkarî) bi te re bikim."

Şêr, dengê rovî bihîst û zehf dilxweş bû ku, rizqê wî ji xweber hatiye nik wî. Bi dengê jar û melûl gote rovî: "Ez nexweş im, li ber mirinê me, li hêviya dostekî wekî te bûm da ez qewt û wesiyetên xwe lê bikim." Rovî got: "Ya şahê daristanê, qewt û wesiyetên xwe bibêje, ez li te guhdarî dikim."

Şêr gote rovî: "Qewt û wesiyetên min bi dizî ne, min navê ji daristanê kesek pê bihise. Were ba min ku ez di guhê te de bibêjim."

Rovî got şêr: "Guhên min ji dûrayî ve jî dibihîze, ne pêwîst e ku ez bême nêzikî te, tu hêdî hêdî wesiyetên xwe bi dengê nîzim, di ber xwe de bibêje dîsa wê dengê te bigihîje heta guhên min."

Şêr got: "Qey tu li min ewle nabî, ji bo çî tu ji min direvî?"

Rovî got: "Fermo, ez çiqas xiyal û bala xwe didime rewş û dîmena te û derdora te, çî dewş û şopên ku hatine ber bi te ve, ne zivîrîne. Ev tê vê wateyê, (têgihê) çavên te ne li qewt û wesiyetên ku tu li min bikî, çavên te lê ye tu min bixwî."

Roviyê şehreza dev ji yarmetiya (alîkariya) ku bi şêr bike qeriya û jê bi dûr ket.

i. Omof

Roj baş Sîdar

Hey Sîdar!

Xwendevana biçûk a pirr mezin! Min bêriya te kiriye. Tu dizanî her kes li vira bawer nake ku, te fakulteya zimanê Kurdî tamam nekiriye. Ma ne tuyî weke agir bi xwendinê ve diçî, belkî tu ji bavê min jî, zûtir dixwînî.

Mirovên li viran e, ji bo te hinekî serê xwe hişk dikin, ji min bawer nakin ku, temenê (umrê) te hîna nebûye 13 sal. Ez çawa bikim, ne tenê dibêjin Sîdar zimanê Kurdî kuta kiriye, lê wiha jî dibêjin, gengaz (mumkûn) nîn e ku, mirovekî hezar kursên spîkeriya radyoyê nedîtibin nikarin, ev qas serbest xeber bidin.

Sîdar! Ez ketima belate, hergav heval dibêjin: "De ka ji me re behsa Sîdarê bike." Ez

hinekî behsa şerê te û B. Botanî dikim û dibêjim: "Sîdarê biryara xwe daye ku, heta dawiyê bi şoreşê re bimeşe." Kenê hevalan bilind dibe, dema ku ez dibêjim min carnan ji Sîdar re digot. "Sîdar ez ditirsim tu dema mezin bibî bibêjî ez nayê." Te jî digot: "Hema min niha bibin."


Sîdar! Radyo ya we, Dengê Serxwebûnê biçûk e, lê hunermendiya te mezin e. Tu dikarî bi hêsanî (rihetî)

bibî xebatkareke Dengê Komara Kurdistanê Serbixwe. Sîdar! Ez niha cihê te hazir dikim, kinc mincên xwe hazir bike, barê me giran e, rê dûr e, di Geliyê Azadiyê de, li ber dengê balefirên dijmin tamera din ya kar û xebatê heye. Bila qutibê bakur ji xwe diyê xwe re be. Dayîka me, welatê me li benda me tevan e.

De haydê Sîdar ez li hêviya te me.

Rizgar





EYY XWEDÊ ÊDÎ BES E LOO!

MUSA ANTER

Ji bo me Kurdan, zaliman lûgatek çêkeriye. Di lûgata wan de, navê kuştina me Kurdan paqijî ye. Û tîrbên me yên bi hev re jî, tim best, gelî, çem û newal in. Li Sêrtê Newala Qesaba, li Dêrsimê Çemê Munzûrê, Geliyê Zilan, Newala Qutê, Sîh û Sê Gule, Çukurca û Helepçe. Ey Xwedê, êdî bes e lo!

welat

• Li ser navê ÎMC Basın-Yayın Ltd. Şti. (adına) Xwedî (Sahibi) Zübeyir Aydar • Mudurê Dezgahê (Müessese Müdürü) Zübeyir Çakır
• Berpirsiyarê Giştî (Genel Yayın Yönetmeni) Abdullah Keskin • Berpirsiyarê Nivîsaran (Yazı İşleri Müdürü) Mazhar Günbat
• Navnîşan (Adres): Nuruosmaniye Cad. Atay Apt. No:5 Kat:1 D. 4 • Cağaloğlu / İstanbul • Tel:511 57 60 - 511 66 02
• Fax: 511 51 57 • Berpirsiyariya Ewrûpa • Postfach: 1531, 5300 Bonn 1, Germany • Tel: (49) 228-630990 • Fax: (49) 228-630715
• Berpirsiyariya Fransa: Amed Jemo • Rua G-401 92763 Antony Cedex France
• Çapkirin (Baskı): Metinler Matbaacılık • Belavkirin (Dağıtım): Birleşik Basın Dağıtım AŞ